Newroz

Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .**
* **Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .**

***Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê* - YEKÎTÎ**

Hejmar (92) sal 16 Hizêran 2010 z - 2622 k Buha (15)ps

Di bîranîna damezrandina yekemîn partî de bona gelê Kurd li Sûriyê

Roja 14 -î meha Hezêrana sala **1957** an, li Sûriyê, Bajarê Helebê, taxa (Sûq El-xemîs), di mala rehmetî Mihemed Elî Xoce de civateke dîrokî dihate lidarxistin , û beşdaran biryara xwe dabûn, ku li damezrandin û aşkerekirina hebûn û xebata partiyeke demoqrat, bona gelê Kurd li Sûriyê bibine xwedî.

Di vê bîranînê de, hêjaye ku navên beşdarên wê civata dîrokî bêne rêzkirin: **Osman Sebrî** (gundê Narincê – K.Turkiyê), **Reşîd Hemo** (gundê Hopka – herêma Kurdaxê), **Hemze Niwêran** (G.Qeremanê – H.Cizîrê), **Mihemed Elî Xoce** (G.Mabeta – H.Kurdaxê), **parêzer Şewket Henan** (G.Tilifê – H.Kurdaxê), **Dr.Xelîl Ebdulla** (G.Keferdela jorîn – H.Kurdaxê), **Hemîd Derwîş** (G.Qeremanê – H.Cizîrê).

Lê, divê bête zanîn jî ku, di qonaxa salên ji berî 1957 an de, gelek danistandin, çalakî, civat, komele û komcivîn di nav xwendekar û ronakbîrên Kurd de li dar ketibûn, nemaze li Amûdê, Şamê, Hesekê, Heleb û Efrînê …H.W.D. piraniya wan civat û çalakiyan bona alîkarî û piştgiriya xwendekariyê ,hest û şêweyên hevkariya civakî û bikaranîna zimanê dê bû .**D.R.(11)**

Ferqa di navbera …..
Arêf zêrevan 6

Pakrewana……
Mihemed Qere 7

Bajarê jinebiyan
Hêvîdar Zana 9

Dîroka……
Memê Alan 10

Email : Newroz 95 @ hotmail . com